

## **Zanyariyên bo daxwazvanên di SGB II (Pertuka Yasaya Komelgehî II) de - kesên nu koçkirî -**

### **Bo axaftin / daxwaznamedan li jobcentera deverî pêwistîya we bi pêşkêşkirina çî belgeyan / dokumentan heye?**

- Biryara mafdayina rewşa runiştina we ji bal BAMF (Fermangeha koçber u penaberan)
- Belgeya we ya bicîhkirin an mafê daniştinê bi xanînîşandanê

### **Çi dem maf bo wergirtina alîkarîya gorî SGB II heye?**

- Heke mercên din yên gorî benda 7 SGB cîbicî bibin, kane maf bi naskirina wesfa penaberî pêkwere.
- Pêwiste hun mafêdariya xo bi pêşkêşkirina belgeya niştecihî tev biryara naskirina we, ya bi wesfê penaberîyê u mafê we yê runiştinê bi bingehbikin/îspat bikin.
- Ji holrabuna wesfê penaberîyê mafê alîkarîwergirtinê gorî SGB II namîne.
- Bi ji holrabuna alîkarîya gorî SGB II pêde te`mîna we ya saxlemîyê namîne.

### **Zanyariyên taybet yên navberîkirina kar**

- Dayina **pabendbuna yekxistinê** u axaftina mafdarê kursa yekxistinê li qezayê destpêdike, heke we pabendbuna mafdarekî din ta vê demê wernegirtibin.
- **Bes piştî tamamkirina sekeftî ya kursek yekxistinê dikane li ser yekxistina we, ya pişeyî / meslekî were axaftin.**
- Gelo em bi çî awayî dikanin alîkarî u navberkirinên bo kar cîbicî bikin, girêdayî rewşa we, ya serdemî u bilindahîya zimannasîya we ye.
- Heke hun ji jobcentera deverä teklâfön kar bigrin, divöt hun di nav 3 rojan de bi awayekî gorî daxwaza karsaz serlêdanê bikin.

Piştire hun bi nivîs jobcentera deverî agahdar dikan, ka we kînga serî li kompanyekê daye u netîca wê, qasî ku agaha we jê hebe, çî ye.

Bo agahdayina we formek li gel teklîfa kar heye, divêt hun wê formê tijî bikin u bi desnîşana xo bo jobcentera deverî binêrin.

- Heke hun bi çalakî li karekî digerrin, wê demê hun dikanin dawakarîya alîkarîyê bo mesrefên xo, yê hatuçunê, diruskirina serîlêdanên bo karî uyd bikin. Karmendê berpirs biryarê li ser pêwistî u lixwegirtinîya daxwaza we dide.
- Heke hun karekî bi pabendîya te`mîna civakî bi destxin, hun dikanin daxwaza piştgirîdayina mesrefên xo yê rojane di nabeyna mal u kar de u her wisa bo cilubergê karî u xoamadekirinî bikin. Karmendê berpirs biryarê li ser pêwistî u lixwegirtinîya daxwaza we dide.
- **Girîng ew e, ko hemu daxwazname bo piştgirîkirina alîkarî, yê hin dozdiin, divêtin berî destbikarkirina we bin.** Heke hun piştî destpêkirina kar daxwaza iştgirîkirina alîkarî bikin, dikane daxwaznameya we ji ber derengîketinê were redkirin.